# HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ
## *PEOPLES' DEMOCRATIC PARTY*

Birêz Dr. Letîf Reşîd

Serok komarê Iraq'a Federal

Bexda

Rêzdar Letîf Reşîd,

Bi boneya hilbijartina we ji aliyê Parlamentoya Iraqê ve bo Serokatiya Iraq'a Federal Em we pîroz dikin û di erkê weyê nû kû di van Şert û mercên giranên gelê herêmê tê de drbas dibe de we hilgirtîye em serkeftinê ji were dixwazin.

Em dizanin ku gelên Iraqê yên ku berdêlên giran ji bo aramiya siyasî û azadiyan dane û dixwazin li ser bingeha aşîtî, demokrasi û diyalogê derbasî serdema nû bibin, li ser bingeha lihevkirin, bi hevre jîn û diyalogê, hêviyên mezin ji we hene. Ji bo vê yekê em dixwazin wek HDP herdem piştevaniya hewldanên we yên ji bo avakirina hikûmeta nû ya Iraq'ê û herwiha bihêzkirina aştiya civakî û lihevkirina li seranserê welêt diyar bikin.

Di çarçoveya azmûn û zanyariyên we de, em di wê baweriyê de ne ku hûn ê hewl bidin ku pirsgirêkan bi rêyên aştiyane, li ser bingeha lihevkirin û diyaloga di navbera aliyên siyasî de, li gorî pêkhateya pirçandî û nasnameya welat çareser bikin.

Bi vê minasebetê em serkeftineke mezin ji we re di erkê Serokomariya Iraq'ê de dixwazin û rêz û hurmetên xwe pêşkêşî we dikin.

Pervîn Buldan-Mithat Sancar

Hevserokên HDP'ê

15 Cotmeh 2022